EVE

MEWLUD

MÛḦEMMED EMÎN ḦEYDERÎ

BÛ NESRÎ MÛHACIRÎ

14 cemadê elt̃anî 1402

Têbîn : 8 tîpên erebî hene di tîpên kurdî de tunene me xwest ku em van her 9 tîpan bidin nasîn û hin nîşandekan ji wan re dînin, ta ku xwendevanên hêja astengiyê di xwendina vê mûlidê de nebînin û bi zarê kurdî karibin bixwînin .
Û her 8 tîpên ku me nîşandek ji wan re danîne evin ;

1- ع = (’)
2- ط = (t́)
3- غ = (ẍ)
4- ح = (ḧ)
5- ض = (d̃)
6- ظ = (ž)
7- ذ = (ż)
8- ث = (t̃)

Arşek Baravî

Em didin ḧemdê Xwedê ey musilman

Daye me pêxemberê axir zeman

Ew Xwedayê go hedayet daye me

Ni’meta xweş dînê islam daye me

Ni’meta ji her ni’metê xweş pir eve

Mineta ji her minetê mestir eve

Go îman aniye bi rebbê e’zîm

Em mûşerref bûn bi Qurana kerîm

Ey Xwedanê xaliqê erd̃ û sema

Tû nehêlî ummeta ha der ẍema

Em gunehkar çav li ẍufrana te ne

Hêvîdarê reḧm û iḧsana te ne

Em bi îman bêne erd̃ê meḧşerê

Pey Mûḧemmed herne ḧewdê kewt̃erê

Ey Mûḧemmed ey şefî'ê ummetê

Hadî û Mehdî ḧebîbê i'zetê

Ey tu bû yê çêtirî ji kewn û mekan

Şehsiwarê a'limê fexr û cîhan

Ey Mûḧemmed ey resûlê ins û cin

Xwedî tac û beyreqa roja mezin

Mesneda vê ummeta han her tu yî

Derê fetḧa cenneta me her tu yî

Ey Mûḧemmed ey îmamê enbiya

Ey tu nûra rûḧ û canê ewliya

Em gunehkar û ẕe’îfin bê e’mel

Hêvî ma e’fwa Xwedê e’zze we cel

Em bi cahê te xelas bin ey nebî

Rûḧ û canê me fîda canê te bî

Hûn ji i’şqa dil bibêjin berdewam

Ser Mûḧemmed esselaťû wesselam

Ew kesê go ťalibê xêrê pirre

Guh bidin vê mewluda pêxembere

Ev rîwayet go ji Mûḧemmed hatiye

Qedrê mewluda min ê go girtiye

Hin pere mesref kirî ber mewludê

Wek çiyakî zêr di xêrê de didê

Got Ebû Bekrê sidîq kî xêr kire

Go di ber mewludê serfkî hin pere

Hem bidî xwendin bizanê qîmetê

Bû hevalê min di rêka cennetê

Got U’mer mewlud ku ê teqdîr kirî

Wî ji xwe re islametî pir xweş kirî

Gotî U’tman mesrefa mewludê deyn

Wek tu çûyî ẍezweta Bedr û Ḧuneyn

Hem E’lî derḧeqê wê de gotiye

Qedrê mewluda MûḦemmed girtiye

Wê bi îman derkevî bal axretê

Bê ḧîsab ew kes diçî faq cennetê

Yusrî Fexridînê razî hem Cûneyd

Yafi’ û Me’rûfê kerxî ey U’beyd

Her weha şêx û ewliyata yek bi yek

Wesfê mewluda Mûḧemmed dan gelek

Gotine go ew merovê qencî zan

Bakî çend ehl û cîranê musilman

Wergerê libsê mûnasib bihnê xewş

Hem bidî xwendin bi kêf û dilkî xweş

Ew diçî heşrê digel sefa berê

Wê vexwî avê ji ḧewdê kewt̃erê

Ê bixwînî ser pera pir zêde lê

Ḧeq te’ala zêde wê dê berketê

Go sûal jê tê kirin bê tirs didê

Lê di qebrê da cewabek xweş didê

Xaniyê mewlud go têda xwendine

Tê ḧemandin ew ji diz û dijmine

Hem ji şewt û ẍerq û afat û bela

Hem ḧesûd û çav xerab û hem ẍela

Kî bi mewludê re deynî xwarinê

Çend mislman guh bidin vê xwendinê

Ê bixût zad û te’amê mewludê

Têne qelbê wî hezar reḧma Xwedê

Yan bixwî xwê hem genim yan şerbetê

Ew ji qelbê wî dibê her i’letê

Meclisa mewlud go tê xwendin liwê

Lê ḧeta salkê melek naçin ji wê

Hem didin reḧm û selatan ser kesê

Daye xwendin mewluda wê meclisê

Kî dixwazî go Mûḧemmed şah bibî

Qîmetê vê mewluda wî zane bî

Go bi ḧuba wî îman kamil dibî

Cenneta baqî bi wî ḧasil dibî

Ew kesê i’şqa Mûḧemmed pêre bî

Ger bikî qesda cihê mewlud hebî

Ê go qîmet dane mewluda nebî

Bûn xwedî qedr û keramet ey ebî

Hem ji i’şqa wesfê wî mesref kirin

Wan meqamê a’lî xeyrê pir birin

Em bi mewluda Mûḧemmed pir xweşin

Em misilman ser bilindin dil geşin

Ez ji beḧ̃ta wesfê wî dûrim ḧeqîr

Dil mirîme nine i’şqa min feqîr

Hûn ji i’şqa dil bibêjin berdewam

Ser Mûḧemmed esselatû wesselam

Ewelî tiştê Xwedê îcad kirî

Wî ji nûra xwe Mûḧemmed çê kirî

Ger tê yek parçe ji nûrê go bibe

Lê ḧebîbê min Mûḧemmed çê bibe

Heyşt hezar sal çûn Mûḧemmed hê hebû

Erd̃ û esman E’rş û kursî yek nebû

Paşî kir nav beḧrê nûrê der ḧîcab

Ḧemd û tesbîḧê Xwedê kir bê ḧîsab

Ew ji beḧrê anî der wî secde bir

Go ji bo vê secdê min xelqa te kir

Ewelê xelqê tiwî axir nebî

Tiştê mayî wê ji te peyda bibî

Wî ji fedya girtî xwêdanek dida

Nuqteyek nûrê li eṫrafan veda

Jê dibarî sed û bîst û çar hezar

Her yekî bû yek nebiyê dil şiyar

Paşî yek cewher ji wê nûra celî

Kir du şeq yek jê kir beḧr û hem gelî

Ya gelî kefda disera bû duxan

Kef bû erd̃ û duxan bû asiman

Şeqê nûra dî Xwedê jê kirye çar

E’rş û kursî û qelem lewḧe kubar

Ḧeq te’ala gotî Cibrîlê emîn

Tu ji cê qebra Mûḧemmed axnê bîn

Avekê safî bi wê axê bikîr

Tevlî wê nûra Mûḧemmed bik hevîr

Bû wekî durra sipî pir şu’le da

Çû sicûdê hem kirî ẗemdê Xweda

Hem Xwedê gotî qelem binvîs hema

Go çi binvîsim liber emrê tema

Gotê binvîs la îlahe illellah

Hem Mûẗemmed bû resûlullahî şah

Lê qelem got ya îlah el a’lemîn

Kî Mûẗemmed ev çi navê pir şêrîn

Ê dibin navê te re deynim kîye

Muẗbeta wî pir li min xweş hatiye

Hem Xwedê got ya qelem ger ew neba

Erd̃ û esman ne felek wê yek neba

Lewḧ û Kursî û Qelem E’rşê mezin

Cunnet û Melk û Cehenem Ins û Cin

Herçi mexlûqê hene ta axirî

Min ji bo navê Mûḧemmed çêkirî

Wî silav da ser Mûḧemmed kir xît́ab

Ber Mûḧemmed ve Xwedê daye cewab

Go e’leyke el selam û reḧmetî

Ev Qelem bû serxweş û pir dil ketî

Go ji hingî bûye sunnet ev selam

Wacibe reda selamê berdewam

Ew ji ber i’şqa Mûḧemmed bû du şeq

Hem li ser loḧê nivîsî emrê ḧeq

Wê ji Adem ta herî axir zeman

Umetên pêxemberan kirne beyan

Go ji Xwedê re bikî hin t́a’etê

Wê bi fed̃la wî herî der cennetê

Ê guneh kar wî bişênî cehnemê

Ummetên pêxemberan danîn hemê

Ew ḧeta navê Mûḧemmed pey de tê

Kirko wana deynî ḧalê ummetê

Ḧeq te’ala go teedeb ey qelem

Heybetê girtî qelem ma der elem

Go çi deynim der ḧeqê vê ummetê

Bo Mûḧemmed ey Xwedanê i’zetê

Gotî deyne ummeta Eẖmed bi nûr

Ew gunehkar rebbê wan rebbek xefûr

Wî wisa danî di loẖê de temam

Ma dibin ẖukmê Xwedê de wesselam

Hûn ji i’şqa dil bibêjin berdewam

Ser Mûẖemmed esselatû wesselam

Çûn Xwedê xwestê go Adem çê bikî

Hem ji wî dibê zuryetê zêde bikî

Wî li qendîla Mûẖemmed kir neẕer

Nuqṭa xwêdanê ji nûrê hate der

Daketî ser axa Adem bû herî

Emrî rûḧ kir ket cesed wî çêkirî

Ji Ibin E’bas ev rîwayet hatiye

Go nebiyê Mûḧemmed ev gotiye

Ez nebî bûm çend hezar sal hê berî

Bavê me Adem hêj av û herî

Ḧeq te’ala gote Adem ba wefa

Hilgere nûra Mûḧemmed Mûsťefa

Go Xwedê nûra Mûḧemmed danî pişt

Şu’le da nav cennetê baẍ û buhişt

Go tu û Ḧewa herin nav cennetê

Herdû serbestin li kêf û liżetê

Heçî tiştê go bixwazin hûn bixun

Ẍeyrî vê dara genim hûn jê nexun

Ew dinava cennetê mane gelek

Dîn ji pare tên temaşa wî melek

Gotî ya reb ev ji bo çi têne paş

Go li wê nûra Mûḧemmed mane şaş

Gotî ya reb bêne pêş nûra mezin

Da melek bêne mûqabil wechê min

Nûr ji pişтê anî anê ḧeq Xwedê

Hin dibêjin anî tilya şahidê

Gotî ya reb ma ji vê nûrê heye

Gotê nûra çar yarê wî heye

Gotî Adem ya îlahî el eman

Bîne van tilyan evan nûrê go man

Hatî tilya navî nûra Bû Bekir

Ya U’mer tilya liber wê şu’le kir

Nûra U’t’man hat qelîcê ya ́teref

Ya E’lî hat ya mezin dayî şeref

Hatî ̈Hewa gotî Adem ey ̈hebîb

Ev çi nûra safî nazik reng ̈xerîb

Gotê ev nûra ̈hebîbê e’izeme

Ew ji her pêxemberan re xatîme

Wextê wan bê emrî kir ji darê xwar

Dîsa ew nûr çûye pişte bû sitar

Qet nema perçek ji erd̃a cennetê

Ila wan lê kir limêj û t́a’etê

Nêzî wê dara genim nedbûn yeqîn

Hatin xapandin bi Iblîsê le’în

Sûnd dixwar Şeyt́an di go ez nasïhim

Namirin ger hûn bixun dara genim

Ew ji rê çûn ketne dava ḧesedê

Wan genim xwar jbîrkirin emrê Xwedê

Mane tazî ew ji libsê rîş û per

Lew Xwedê goj cenneta min herne der

Ket serendîbê li erd̃a hindê tek

Pir girî û ah û nalîn çûn felek

Pir go poşman bû hinavê xwe disot

Ayeta (ina želemna) her di got

Û di wî ḧalê girîde dî li ’Erş

Wî li bin navê xwe dî navekî xweş

Dîtî la îlahe ilellahî heye

Hem Mûḧemmed resûlullahî heye

Go bi ḧeqê wîkî Adem gotiye

Te di bin navê xwe re ew daniye

Min ’efûkî ya îlahî bankirî

Hem selatan ser Mûḧemmed dakirî

Wî Mûḧemmed daye ber xwe tobe kir

Ḧeq te’ala deryê tobê lê vekir

Hat Cibrîl gotî Adem be isûl

Toba te ji bo MûḦemmed bû qebûl

Her bibîne qisseta pêximbera

Pir bicahê wî ’efû bûn ey bira

Ya îlahî tu qisûrê me bide

Xatirê navê MûḦemmed ey Xwedê

Hûn ji ’işqa dil bibêjin berdewam

Ser MûḦemmed esselatû wesselam

Bav û ecdadê MûḦemmed ta bi jor

Cennetîne merd û mêrxas û cesûr

Bavê wî Adem Ḧeta ’Ednan hene

Lê ne ser rastin rîwayet tê hene

Silsîla wî tev esîlin faxirin

Dê û bavê wî temîzin ṫahirin

Lê ji ’Ednan bê ḧeta bavêd ewî

Bîst û yek bavin hemî rast û qewî

Paşê ew nûra Mûḧemmed Mûsṫefa

Hat ji Adem çûye şîẗê ba wefa

Neqlê Idrîs Nûh û Sam bû her weha

Ta bi Ibrahîm û Isma’îl giha

Hatî ’Ednan Me’id û Nîzar hem Muḏer

Çûye Ilyas Mudrikê Xuzeyme her

Hat Kînane Nedr û Malik çû Feher

Ẍalib û Lûey bî Ke’ib û Miret ber

Hat Ḧekîm û çû Qusey û ’Ebdulmenaf

Haşim û ’Ebdilmuṫelib ew bê xîlaf

Çû ji ’Ebdilmuṫelib nûra hûmam

Hat ji ’Ebdullah re bû pişṫek temam

Wechê ’Ebdullah go nûrê lê veda

Bû wekî hêva li çarda şu’ileda

Pir jin û qîzên Qureyşî û ’Ereb

Dil ketin Ḣusna wî xwestin roj û şev

Carekê wî bal yekê meylek ne bû

Çimkî ew nûra MûḦeemmed pêre bû

Rojekê ’Ebdullah gote bavê xwe

Daye der esrar û keşf û Ḣalê xwe

Gotê bavo çendê car û çend mehê

Ez tenê diçme newalê mekkehê

Nûr ji min tê der dibî perçe ji hev

Diçne şerq û ẍerbê dîsa têne hev

Dengê erd̃ê tê guhê min go dibê

’Ebdullah bavê Mûḧemmed wê tu bê

Dengê ẍeybî hat di go ev mujdeye

Nûra Eḧmed wê bi ’Ebdullah reye

Dara hişk rûnêm li bin ew şîn dibî

Go ji bin çûm wek berê ew hişk dibî

Nûr ji min derket diber esmana çû

Dîsa hatî ser mira wek ewrê nû

Bêje bavo ev keramet ka çiye

Jêre gotî min li te mizgîniye

Hêviya min her Xwedaye ey ciwan

Wê ji te pêxemberê axir zeman

Wê ji pişta te Mûḧemmed çê bibî

Xatimê pêxemberan wê rabibî

Min di xewda dî go dengek hatî min

Gotî bavê Mûḧemmed canê min

Hûn ji ’işqa dil bibêjin berdewam

Ser Mûḧemmed esselatû wesselam

Çê bû ’Ebdullah Ḧesûdî hat kirin

Ehlê eḦbar û kîtaban fêmkirin

Çi nîşanek bo wicûda wî hebû

Rahib û tarîxçiyan hay jê hebû

Go nebî yiḦya şehîd bûye li şam

Cubbê xwînê peyv hilandin bû ’ilam

Wextê ew xwîna go hişk terre dibî

’Ebdullah bavê MûḦemmed çê dibî

Dîn go xwîna ter ji cubbe hatî xwar

Rahiban got hey hewar û sed hewar

Wextê nêzîk go MûḦemmed çê bibî

Ḧukmê pût û rahiban ibt́al dibî

Herne ’Ebdullah bibînin fursetê

Ka bi ḧîla nakujin wê dewletê

Ehlê kufrê hem yehûda çendî car

Çûne dora mekkehê lê bûn şiyar

ḦHafizê ’Ebdullah rebbê mezina

Tê ḧimandin ew ji koma dujmina

’Ebdullah xortek gîhayî taze bû

Bilxisûs nûra MûḧemmedpêrebûGo giha ḧedê kemalê pir delal

Hatinê heftê cihû ji qewmê ḏelal

’Ehd û soz dan hev ji şam em dê herrin

Em ji dora mekkehê na vegerin

Ta ne kuştin bî bidestê me temam

Ax û ava şam liser me bû ẗeram

Çend meh û rojan li ber danîn kemîn

Kengî bê der wê bikî parçe yeqîn

Rokê dîtin ’Ebdullah wa hate der

Ew tenê bû van hicûmek dane ser

Hem Weheb jî çûbû seydê bû delîl

Ew bû bavê Amîne xatûn esîl

Ew hicûma wek gurê go bêne pez

Wan bi çavan dî belê dîtî bilez

Hate xwarê ’eskerê ẍeybê fetak

Wan bi yek derbê cihû kirne helak

Go Weheb dî hate ser wan ev ’ecîb

Hem ji ’Ebdullah dî ev îşê ẍerîb

Muḧbeta ’Ebdullah ket qelbê Weheb

Zû vegerya hate malê der ’eceb

Ev ḧîkayet got ’iyal û ehlê xwe

Min di ḧeqê ’Ebdullah dî bi çavê xwe

Got jina xwe rabe here zû bi edeb

Bêje ’Ebdulmuťelib şêxê ’Ereb

Wî li cem min yek keça nazik heye

Ḧorî ťeb’e nazinîn û tazeye

Ger divê bo ’Ebdullah bînî jinê

Nîne miT̃lê Amîne dora dine

Bêje ’Ebdullah go ew jî raziye

Min ji wîre amîne laiq diye

Ew xeber çû gote ’Ebdulmuṫelib

Hem ji ’Ebdullah re çêbû meyl û ḧub

’Ebdullah gotî diya xwe ba şepal

Her bixwaze yek jina ḧusn û cemal

Her bibîne yek keça bi esl û neseb

Go nebî wek wê dinav tuxmê ’Ereb

Faṫîme çû dîtina qîzê hûmam

Ketiye nav êl û qureyşiyan temam

Go vegerya gote ’Ebdullah eman

Min kirin teftîş gelek qîzê ciwan

Bejn û bala wan şepalî pir şêrîn

Eslê ťahir babetê te nazinîn

Min ji ẍeyrî Amîne laiq nedî

Gotî dayê her bibîne care dî

Faťîme çû dît û hat go canê min

Nîne wek wê der dinê de qîz û jin

Nabî wek wê ḧorî û ba'izz û naz

Gote 'Ebdulmuťelib her wê bixwaz

Çûn û xwestin wan ji bavê Amîne

Kirne kara dawetê zû hatine

Wan weqîk zîv û weqîk zêr pêre dan

Sed deve sed pez û sed çêlek ciwan

Wan çiqas mesref kirin ber Amîne

Her wekî sêvek didan û hatine

Ban kirin êl û ’eşîran xas û ’am

Wan ’ecêbek çêkirin zad û ́te’am

Pir qureyşî û ’Ereb hatin bideng

Xeml û ẖusna Amîne bû renge reng

Roja înê bû nehê heyva receb

Bû nîkaẖa Amîne qîza weheb

Wê şeva ’Ebdullah bû zava birin

Go dibêjin sed jinê mekkê mirin

Bûk û zava çûne xelwê man tenê

Wê şevê ’eşqek ketî nava dine

Masiyê beḧran de mizgîn dane hev

Ťeyr û ḧeywan kirne ḧemdê ḧeq bidev

Ḧûr û ẍulman û melek nav cennetê

Kirne kêf û şahiya vê dawetê

Ḧeq te’ala emrê cibraîl dikî

Bêje riḏwan berderê cennet vekî

Bêje malik bigrî derê cehnemê

Paşî mizgînê bibe nav ’alemê

Xul xule ket erd û esman û ciha

Dengê tesbîḧan li her erḏê giha

Hatî cibrîl daye mizgîn û xeber

Erḏ û esman şerq û ẍerb û beḧr û ber

Beyreqa nûrê li ser ke’bê veda

Gote xelqê ev zemanê Ei̇̈hmeda

Ev şeva nûra Mûi̇̈hemmed bû nefil

Çûye beínê Amîne pê bû i̇̈hemil

Hatî dora xatemê pêxembera

Hat dema dînê Mûi̇̈heemmed eşkera

Hat zemanê i̇̈heq bi destê dil yeka

Çû zemanê pût perist û muşrika

Wê şevê pir bûn ’elamet bê jimar

Text û kursiyê milûkan hatne xwar

Textê qeyser hat qulabtin ser devê

Di stû hev werbûn senem ’eynê şevê

Şeq bû eywana melek kesra yeqîn

Hem şikestî textê Iblîsê le’în

Çû çiyayê bû qebîsê bakirî

Cumle Şeyt́an lê gihan man ḧeyirî

Jêre gotin ka reva te ji bo çiye?

Ta bi canê te ji tirsan girtiye

Ev çi tirs û nale nale û welwele?

Ev çi dehşet ev çi dengek zelzele

Gote Şeyt́an tev li dorê têne hev

Ya di destê minde îro maye rev

Zelzele û tirsa mezin ḧeqê mine

Go Mûḧemmed çûye bet́nê Amîne

Ew go çê bû rûmeta me qeť nema

Wê hilîne dînê pût û senema

Qîmetê ḧîla nema go ew giha

Wê bi şûrê ḧeq bike feṯha ciha

Hûn ji ’işqa dil bibêjin berdewam

Ser Mûḧemmed esselatû wesselam

Amîne go ḧemlê min şeş meh temam

Hatî ’Ebdulmuťelib da yek selam

Gotê ’Ebdullah xwe rabe kar bike

Ber bi şamê taciryekê her bike

Tu ji medînê xurmena bome bikir

Hem te’am û xwarinê bîne veger

Go Xwedê kurekî bi Amîne bidî

Xwarinek baş tu bişêranî bidî

’Ebdullah rabû xwe karkir çû ji mal

Bîst û pênc sal ’emrê wî xortê delal

Çûye şamê hat medînê ah û ah

Go wefat bû hate ser emrê îlah

Ḧisreta bûna MûḦemmed pêre ma

Hem MûḦemmed bav nedî bê xem nema

Karwanê pêre hatî ber bi mal

Wan ji ’Ebdumuṫelib re gotî Ḧal

Wextê ’Ebdulmuttelib Ḧal fêm kirî

Hat xeber da Amîne pir da girî

Go ḧebîbê min wefat bû ey Xweda

Hem kurê min ma yetîm rûḧêm fîda

Dayê ’Ebdulmuṫelib sebrek ema

Hesreta ’Ebdullah carek dilde ma

Him dinava erd̃ û esman bû ḧezin

Ê bihîstî ma di vê ḧuzna mezin

Hem melek gotin îlahî bakirin

Em bi çêbûna MûḧemmedŞakirin

Ya go îro zêde bûye kerbê me

Go MûḧemmedmaYetîmeyrebbême

Heq te’ala go ji we zana tirim

Ej MûḦemmed re ji dê û bav çêtirim

Me ji ezelde daniye emrek ’ezîm

Wê MûḦemmed bête dunya ê yetîm

Ey birayê musilman guhdarî bin

Qîmetê zarwê yetîm pir zanibin

Amîne got neh mehê Ḧemlê me çûn

Pir îşaret hem ’elamet zêde bûn

ZeḦmetî qeṫ min ji Ḧemlê xwe nedî

Wek jinê xelqê eżiyet min nedî

Pir keramet min didî di xewna Xweda

Her mehê pêxemberek mizgîn dida

Heyva ewil hatî Adem kir kelam

û li Mûḧemmed merḧeba hem kir selam

Lê meha didwa selam da gotî şît̃

Hat Mûḧemmed xwedyê teiwîl û ḧedît̃

Min nebî Idrîs diye heyva siya

Gotî ḧemlê te reîsê ewliya

Min meha çara di xewda dîtî Nûḧ

Hat Mûḧemmed saḧibê nesr û fitûḧ

Hûd meha pênca di go mizgîn li te

Hat şefî' ê roja ḧeşrê ḧemlê te

Gotî Ibrahîm Xelîl heyva şeşa

Ḧemlê te nebî celîlê dil geşa

Min meha hefta dî Isma'îl żebîḧ

Gotî ẅemlê te xwedyê dînê seẅîẅ

Lê meha heşta di got Mûsa elkelîm

Hat MûẅemmedÌ xwedyê Qurana kerîm

Ya neha ’Isa binû Meryem kir selam

Got eve pêxemberê ser xas û ’am

Xatimê pêxemberaye ev resûl

Pir bi cahê wî reca bûye qebûl

Yek ji tarîxa MûẅeemmedÌ ’îsewî

Pênc sed û heftê û yek sal pişt̂ wî

Bîstê nîsanê bû sala ẅerba fîl

Hem şeva duşembê bû şahê celîl

Diwazdehê heyva rebî’el ewelî

Amîne go mam tenê der menzilî

Çû bû ’Ebdulmuṫelib zarwê wî hem

Çê dikir dîwarê ke’bê der ḧerem

Kes ne bû ji mêr û jina wensa me bê

Hatî wextê go Mûḧemmed çê bibê

Mam di wê tirs û metal û dehşetê

Wê çawabî ez tenê der xelwetê

Min dî ronî daye hundur bê qeder

Şeq bû xanî çar jina jê da bû der

Van jinê rûḧaniyan pir ṣu’ile dan

Çar teref hem bûn sened hem pal vedan

Wan didan mizgîn di go ey Amîne

Em ji bo Ḧemlê te dayin hatine

Bejn û bala wan bilindî xweş fesal

Wek jinê haşimiyan naz û delal

Ew go Ḧewwa Sara Asya pir melîḧ

Yadî Meryem bû diya ’Isa almesîḧ

Nayê wesfê pir go Ḧusna wan hebû

Ḧusna Meryem hêji wana zêde bû

Yek li rast û yek li çep hat yek li pişt

Meryema ’Umranî hat ber min rûnişt

Pir biwan kêfxweş di bûm sebra me hat

Renge rengan dengê tesbîḧan di hat

Şu’ile da hundur tijî rûḧanî bûn

Exlebê dengê didan suryanî bûn

Amîne got erd̃ û esman ṣu’ile da

Ew şeva go çê bibî dostê Xweda

Dayina žahir şeva a mekiya

Dayina şîr bû ḧelîma si’diya

Çû jimin nûrek ji şewqa wî medî

Qesrê busra erd̃ê şamê min didî

Sê ’elem min dî ji nûrê miT̃lê berq

Yek jê danîn mexrib ya dî dane şerq

Beyreqa sisya ji wê nûra leT́îf

Dane ser beytê go ew ke’iba şerîf

Heq te’ala gote cibrîlê emîn

Hin melek ber dakevin erd̃a zemîn

Razîbûna min li ser xwe wergerî

Rabe mizgînê bibe ber her derî

Ber vekî rid̃wan derê her cunnetê

Ḧorî serbestin li kêf û dawetê

Bêje Malik bigrî deryê cehnemî

Gazîke nav erd̃ û esman hemî

Anî cî emrê Xwedê wî yek bi yek

Daketî pêre melek hatin gelek

Ew li dora mekehê bûn sef bi sef

Hem di ser ke'ibê re bûne ref bi ref

Amîne go ez di wî ḧalî de bûm

Bêhnekê da hundur û pê xweş dibûm

Pir melek hatin didestê wan t́ebeq

Hin ji zêr û hin ji zîvê wek şefeq

Hundirû dan ber bixûr û ’enbera

Dan selatan ser Mûḧemmed eşkera

Refkî t́eyrê per ji cewher niklê zêr

Dane tesbîḧan bi dengê xêr û bêr

Çûn û hatin rast û çep t́eyrên belek

Ez di wî ḧalî de tî bûme gelek

Dane min yek qedeḧa şerbetê zû

Min nedî wek wê şêrîn av û gezû

Hem sipîtir bû ji şîr wek berfê sar

Hem şêrîn tir bû ji hingiv min vexwar

Min vexwar têhniya min çû û şikest

Liżet û żewqa me jê dî mame mest

Min dî yek ťeyrê sipî da hundirû

Hatî rûniştî li ber min rû bi rû

Herdû baskê xwe di ser sînga mi bir

Hingê çêbûye MûḦemmed sed şukur

Bû MûḦemmed ťahir û sunet kirî

Dev liken nûr jê hilat çav kilkirî

yek neżer da esimana şu'ileda

min dî tilya şehdê rakir şehde da

Hûn ji ’işqa dil bibêjin berdewam

Ser Mûḧemmed esselatû wesselam

Hat şeva nûr el îman žahir bibî

Hat ḧebîbê go yekî wek wî nebî

Hat Mûḧemmed ewelê xelqê bera

Hat Mûḧemmed axirê pêxembera

Hat Mûḧemmed puşbetanê dewletê

Hat Mûḧemmed ser şivanê ummetê

Hat Mûḧemmed xwedyê Qurana kerîm

Hat Mûḧemmed merd û mêrxas û reḧîm

Hat Mûḧemmed xisletê qenc jêre ne

Hat Mûḧemmed ni’imetê xweş pêrene

Hat Mûḧemmed hat şefî’ê ’asiyan

Hatî dermanê ’elîl û qasiyan

Hat Mûḧemmed hat şefî’el mużnibîn

Hatî nûra ewliya û muiminîn

Hat Mûḧemmed merḧeba sed merḧeba

Hat Mûḧemmed bû şefî’ê mużniba

Hat Mûḧemmed ser ser û çava jî hat

Hat Mûḧemmed roja îmanê hilat

Hat Mûḧemmed saḧibê tac û ’elem

Hat Mûḧemmed çû dema pût û senem

Hat yekî wek wî nebû ji qewmê berê

Hat yekî wek wî nema ta axirê

Hatî sulťanê cemî’ul enbiya

Hatî nûra herdû çavê ewliya

Hat Mûḧemmed mestirê ji her miletan

Ummeta wî çêtire ji her ummetan

Hat Mûḧemmed rêberê herdû ciha

Hatî imdada gunehkarê nuha

Hat Mûḧemmed reḧmeten lil’alemîn

Hat Mûḧemmed xatîmen lilmurselîn

Hûn ji ’işqa dil bibêjin berdewam

Ser Mûḧemmed esselatû wesselam

Ey Mûḧemmed seyidê kewn û mekan

Ey şefî’ê meḧşerê roja giran

Ey tu nûra ẍerb û şerq û meşriqê

Saḧibê tac û bûraq û beyreqê

Nav şêrîn û ser bilindê ’alemê

Merd û mêrxastir ji tuxmê ademê

Xatimê cumla resûl û enbiya

Roniya çav û qilûbên ewliya

Ya ḧebîbullah resûleke sadiqî

Ya resûlullah bi rastî naṫiqî

Sorgulê baxan ji wechê te fedî

Wek te şêrîn û xweşik keskî nedî

Lew ji nûra te şeva reş bû şefeq

Yek işaret go te da heyv bû du şeq

Nuqtekê nûra te da erd̃ û sema

Erd̃ û esman heyv û roj tev têde ma

Ger ji Adem bê heta dunya hebî

Her serê insanekî sê sed dev hebî

Her di devkî de hebê sê sed ziman

Wesfê ḧusna te bibêjin her zeman

Ew ji melyonkê yekê nakin temam

Lew ji nûra ḧeq tu çêbû ey îmam

Hêviya vê ummeta ’asî tu wî

Rêhberê me bal xudanê ḧeq tu wî

Nefsî nefsî go ketî nav ’alemê

Tû şefa’etkî ji bo me wê demê

Em bicahê te dikin nalîn û zar

Bal Xwedê ve dest bilind û histû xwar

Tabi’ê pêxemberê vê ummetê

Pey MûḦemmed herne baẍê cunnetê

Ya îlahî ya ẍefûr û ya Ḣelîm

Ya leẗîf û ya kerîm û ya reḦîm

Hêviya me ey Xwedanê ’alemî

Tû ’efûkî ehlê îmanê hemî

Ger çi em ’ebdê gunehkar pir hene

Lê tu wî rebbê me em ’ebdê tene

Tû qebûlkî van ji bo wechê kerîm

Me ’efûkî tev bi Qurana ’ezîm

Tû qebûlkî vê du’a û xwendinê

Ecrû xêra ê didê vê xwarinê

Bighê rûḧê nûr Mûḧemmed musṫefa

Hem digel al û seḧabê wî teva

Adem û Ḧewwa cemî’ul muminîn

Ê ji wan çêbûn nebî û murselîn

Fî sebîlullah şehîd û ẍaziyan

Ḧacî û lilah cemî’ ê ewliyan

Bighê seydayê me şêx û kamilan

Saliḧan û ’aliman û ’amilan

Ê xerabî kir û yan qencî bi me

Yan xerabî dî û yan qencî ji me

Ê go mewlud daye yan lê bû sebeb

Ê go ḧaḏir bû û yan lê kir ́teleb

Dê û bavê ḧazir û guhdarê me

Mêr û jin sax û mirî hem zarwê me

Bighê rûḧê musilmana mêr û jin

Ehlê îmanê go saxî yan mirin

Ya semi’ û ya mûcîbul de’ewat

Ya cemîlul sebrî ’indel seyiat

Bo Mûḧemmed al û hem esḧabê wî

Bo rûḧê etba’i û hem eḧbabê wî

Bo rûḧê miryê me û ehlê îman

Şêx û seydayê li ser me ḧeqê wan

Ê go teilîf kirye mewlud ey bira

Bo feqîrê Ḧeyderî hem ḧazira

Hûn bixînin fatîḧê bo van temam

Ser Mûḧemmed esslat û esslam